Helîm Yûsif

“ Zanîna agahiyên berfireh li ser rewşa romana kurdî ya berê û ya niha bi hewceyî lêkolîn û nirxandineke berfirehe”

Ez bawer dikim, neheqiyeke mezin di vê pirsê de heye. Temenê romana kurdî zêdeyî heftê salî ye. Bi dehan romanên kurdî li vêderê û wêderê derdikevin, tev wilo jî, hîna pirsa hebûn û nebûna wê dibe. Dibe ku rewşa romana kurdî ji rewşa romana zimanekî din cuda be, ew jî ji rewşa kurdan ya siyasî, civakî û çandî tê. Lê ez dijî pirskirina bi vî awayî me.

Eger kurd hebin, romana wan jî heye. Li cem dijminên kurdan pirsa hebûn û tunebûna wan dibe, lê pirseke weha ji hêla kurdan de, gava ku tê kirin, mirov diheyirîne. Destpêka romana kurdî vedigere sala 1930 î û romanên Erebê Şemo. Ji wê demê heta niha ev roman di gelek qonaxan re derbasbûye. Ji bilî wê qonaxa destpêkê mirov dikare qala sê qonaxên din bike. Yek jê bi navê Rehîmê Qazî û romana pêşmerge, Ibrahîm Ehmed û romana Jana gel tê naskirin. Ya duyem di navbera salên heştêyî û notî de.

Romanên vê qonaxê mîna pirekê bûn di navbera romana kevin û ya nûjen de. Qonaxa sêyem ku ji salên notî heta roja îro tê. Zanîna agahiyên berfireh li ser rewşa romana kurdî ya berê û ya niha bi hewceyî lêkolîn û nirxandineke berfirehe.

ROMAN

Derbarê pirsyara hebûna nivîskar û romannivîsan jî dibêje:
Ev herdu cure hene. Nizanim çima li kurdan û nivîskariya wan bi vî çavî tê nerîn. Li cem miletên din çi heye, li cem kurdan jî heman tişt heye. Taybetî di kêmbûn û pirbûnê de ye, ne ku di hebûn û tunebûnê de. Dibe hejmara romannivîsên kurd ji yên miletên din kêmtir be, lê nabe ku ev kêmbûn û lawaziya ku, ji vê qonaxa dîrokî ya ku kurd tê de dijîn de tê, bibe sedema nedîtin û tunekirina van nivîskaran.

Tunebûna dewleteke kurdan ya serbixwe û xurt û xwedî rol di rojhilata navîn û di cîhanê de dibe sedem ku wêjeya wan jî paşguh bibe

Her weha derbarê hevberkirina romana (kurdî) li gel ya biyaniyan dibêje:
Ev term (romana biyanî)bi hewceyî zelalkirinê ye. Tiştek bi navê romana biyanî nîne. Di hundir vê peyva (biyanî) de bi sedan ziman û çand û netewe hene. Tu qala romana kîjan miletî bikî, tu mecbûrî qala taybetî û rewşa siyasî, çandî, aborî, şaristanî û dîrokî ya wî miletî bikî. Yana mirov dikare qala romannivîsên ku balê dikşînin ser romanên xwe bike.

Ew jî , ji bilî asta hunerî û wêjeyî ya romanê, girêdayî gelek şert û mercên din e. Yek ji wan rewşa milet û welatê ku ew nivîskar jê tê.

Tunebûna dewleteke kurdan ya serbixwe û xurt û xwedî rol di rojhilata navîn û di cîhanê de dibe sedem ku wêjeya wan jî paşguh bibe. Weha jî tunebûna dezgehên wergerê û danasînê. Ev sedemeke derveyî ye.

Hinek sedemên hundirîn jî hene ku girêdayî dûrbûna kurdan ji bajarvanî û medeniyetê ye-ku roman yek ji encamên bajarvaniyê ye-ji bilî meseleyên qedexekirina zimanê kurdî û taybetiyên rewşa kurdan ku her kes dizane.

Sebaret bi pirsyara din, sedemên paşketina romanê li nav Kurdan dibêje:
Ji derveyî pêşdeçûna wêje û edebiyata kurdî bi giştî, mirov nikare qala pêşdeçûna romana kurdî bike. Rewşa nivîskarên kurd-romannivîs jî di nav de-rewşeke tirajedî ye. Di vê tirajediyê de hemû nivîskarên kurd, bi qenc û xerabên xwe, beşdarin. Yan berhem nîne û nivîskar heye, yan berhem heye û weşanxane tune. Weşanxane

ROMAN

hebe, belavkirin tune. Belavkirin hebe, pirsgirêkên zarava û alfabêyan hene.

Hemû çareser bibe, werger tuneye. Werger hebe, reklam û hunera çêkirina navan tuneye. Îca ji romannivîsê kurd tê xwestin ku van karan hemûyan bi hev re û bêyî alîkariya tu kesî bike. Ji bilî hewcedariyên jiyana rojane ku hemû dema nivîskaran hedir dike, ji bilî tunebûna bazara pirtûka kurdî.

Kîjan nivîskarê kurd biserketiye jî, tenê bi keda xwe ya şexsî û bi xwêdana aniya xwe gihijtiye astekê.

Di nav her miletekî ji miletên dunyayê de, çiqasî kêm be, wê du sê romannivîs bêne dîtin ku dewleta wan yan dezgehên wan î rewşenbîrî li wan xwedî derkevin û berhemên wan werdigerînin û zemîna cîhanîbûnê ji bo wan amade bikin. Di vê yekê de kurd mînakeke awartene ku ne hêzeke kurdî ya siyasî û ne dezgeheke rewşenbîrî ji bo vê yekê ji yek nivîskarê kurd re tiştek nekirine. Ev yek di nav pilan û pirojeyên van partiyan û dezgehên wan de nîne. Kîjan nivîskarê kurd biserketiye jî, tenê bi keda xwe ya şexsî û bi xwêdana aniya xwe gihijtiye astekê.

Bi kurtayî, kurd herdem bûne xwedî pirojeyên siyasî û eskerî û. . . lê rojekê ji rojan nebûne xwedî pirojeyekî rewşenbîrî. Yek ji hîmên sereke ji bo avakirina pirojeyekî weha peydakirina imkanên aborî ye.

Divê alîkariya nivîskarê kurd bibe ku karibe bi nivîsandina xwe li ser piyan raweste û berhemên wî bêne belavkirin û wergerandin. Divê pîvan ji bo vê yekê bêne dîtin, da ku mesele nebe kirîna bêdengiya nivîskaran û dana pere û imkanan ji bo çepik û piropagandaya siyasî ya partiyan. Tiştê ku îro ro heye ewe, ji alîkariya afirênerê xwedî berhem bêtir, eger alîkarî hebe, alîkariya wan nivîskaran tê kirin ewên ku dikarin ji bo vê yan wê partiyê li def û zirnê xînin.

Divê qedir û qîmetê bidin wan berhemên afirandî ku, dê ji wêjeya kurdî re bimînin sermiyan û dîrok.

ROMAN